Nagar-Nawar (Girê Brak)

Girê Brak (Nagar) nêzî newala çemê Ceqceq ê ku çemek ji çemên Xabûr e; dikeve li cihê ku ew û çemê newla EL-Red di sêgoşiya Xabûr de digihêjin hev. Gir dora 32 km bi aliyê bakurê rojhilat ve dûrî Hesekê dikeve û 44 km ji aliyê başûrê rojhilat ve dûrî bajarê Qamişlo dikeve.

Girê -Brak yek ji navendên bajêr ên despêkê di helal zêrîn de bi gişt̂ û herêmên Xabûr bi taybet ê herî mezin e. Her wiha yek ji bajarên girîngtirîn e li bakurê Mezopotamyayê di hezarsala 4 û 3 an de b.z.

Ev cihê wê yê stratîjîk li ser riyên bazirganî yên ku ji Babil ji aliyê başûr de û Bajarê Xatî ji aliyê bakur de ta newala Ferat û Derya Spî bi aliyê rojava de, hişte ku ev derên bazirganiyê têkevin bin kontrola wê de.

Dirêjiya Gir digihêje 800 m û panaya wî 600 m û ji bilindbûna wî ji deşta derdorê digihêje 43 m.

Ev bajar hatiye naskirin bi navê Neger an Nagar di nava hezarsala 4 û 3 an b.z de, her wiha di jêderên Hûriyan de bi navê Nawar hatiye naskirin û ew hemwateya gotina Nagar e di zimanê Hûrî de. Di vê dawiyê de bi navê Brak ji aliyê Romaniyan ve hatiye binavkirin û ev nav ji navê gola Brak ya ku li cem bajêr bû.

Di nava qonaxên velêkolînê de şaristaniyek kevnare ku berî serdemên nivîsînê bi hezarên salan bû û piştî serdema Romaniyan bidawî bûye; hat derpêçkirin.

Derpêçkirinên girîngtirîn: perestgeha çavan, peykerên çavan, serya Naram Sîn, Tablêtên Mîxî hin ji wan vedigerin ji Hûriyan re, darêjgehên (qalikên) ji bo çêkirina madenî û amûrên ji kevirên Sewan (kevirê Ebisdiyan), xilik û muhrên stûnî.

Lêkolîn: lêkolîna li vî cihî cara yekem li ser destê lêkolînerê şûnewaran ê îngilîzî Max Malowan, di nava salên 1938-1937 dest pê kir. Piştre careke din di sala 1976 an de bi rêveberiya Joan Oats û lêkolîner Helen Mackdonelid, lêkolîn dest pê kir.

Perestgeha çavan:

Avahiyek girs ku dirêjî û panahiya wê 30*25 m ji qurbangehekê û odeyên rapêçandî bi bedenek ji kelpîçên li ser bingehên kevitrîn avabûne; pêk tê. Qurbangeh bi rêzkevirin rengîn ku bi zêr û zîv hatine xemilandin, her wiha erd û dîwarên wê bi parçeyên mûzayîka ku ji diravên herî yên rengîn hatiye xemilandin. Di hundirê persetgehê de bi sedan peyker hatin dîtin, navê wan kirin (çav) ew peyker li qurbangehê hatibûn danîn wek qurbaniya nûnertiya xwediyên xwe di pêkanîna erkê koletiyê de.

Ew peyker bi teşeyin cuda mîna nîwelaterîbê di navbera banahiya 3 SM û bilindbûna 6 SM de ne, çavên wan girs in û ji kevirê elbastir hatine çêkirin. Li ser bedenên wan peyîkeran xêzikin rast û xwar (zîkzak) weke daberînekê ji cilên wan re; xuya kir. Plansaziya persetgehê û şêwazê xemilandina wê li perestgeha çavan mîna perestgehên Someran e.

- Têblêtek mîxî ew bi xwe belgeyeke zagonî ye vedigere ji şahê Mîtanî re Tûşrata (Tushratta) di çerxa 14 an de b.z.
- Çapa muhrê vedigere ji Talboş Îtîlî kevintirîn serwerê Hûriyan e, navê wî li ser muhrek Akadî di dawya hezarsala 3 an de b.z; hat dîtin.
- Sereyek ji kevirê Elbaster ku anha li mûzeya Birîtanî parastî ye.
- Komikek ji amûrên ji kevirê Obesdiyan û lepkeyan; hatiye çêkirin.
- Nexşa seraya Naram Sîn.